## Kurd-Akad

Wekî Komeleya Qeydkirî ya Tora Akademîsyenên Kurd a sala 2009'an hati damezrandin, armanca me ya dayîzanîn e ku em perwendeyên zanîngehan û akademîsyenan bigihînin hev di nava torekê de. Bi rêya hatina cem hev a pîşe û pisporiyan ku encama vê torê ye, ne bi tenê meydaneke danûstandinê ji bo akademîsyenan ava dibe, her wiha ji bo civaka Kurd jî efektên girîng ên sînerjiyê derdikevin holê. Lewma, ji armancan e ku daxwazên Kurdan ên li Kurdistan û Ewrûpayê li meydanên civakî, çandî û siyasî di asta akademîk de jî bên îfadekirin.

Ji bilî xurtkirina nûneriyeke berjewendiyan a civakî-siyasî, bipêşvebirina miameleya zanistî ya bi mijarên Kurd û Kurdistanê re prensîpeke girîng a xebata me ye. Em perwerdeyê wekî milkê herî biqîmet ê civakekê û kilîta jiyaneke xweser/çarenûsa-xwe-diyarker dibînin, ji ber wê jî, bi ya me pêwistiyek e ku potensiyala perwerdeyê di nava civaka Kurd de bê teşwîqkirin.

**Komên xebatê:** Yek ji stûnên karê me komên xebatê ne ku bala xwe didin ser aliyên tematîk ên cihê.
**Koma xebatê ya zanistê:** Lêkolîna civaka Kurd li Ewrûpayê û Kurdistanê di astekê de ye ku li mirovan girtiye. Destpêkirin û destekkirina miameleyeke zanistî ya bi van mijaran re digihîje asta karê înstîtûyekê ku gavên pêşî bi rengê civînên pisporan û konferansan tên avêtin. Bi pisporên mijaran ên ku tên vexwendin hem mijarên siyasî yên elaqedarî çavkaniyê tên guftûgokirin hem jî aliyên koçberî û întegrasyonê tên minaqeşekirin.
**Koma xebatê ya Projeyên Civakî:** Ev kom demeke dirêj ji doktorên tibê pêk dihat, bi karê jinûve avakirina Kobanê re bû xwedî formateke nû. Ew êdî wek hatina gel hev a akademîsyenan dikare bê dîtin ku di nava gelek înîsiyatîfên ji nû ve avakirina Rojava (beriya her tiştî tibî, ekolojî û perwerde) cihê xwe digirin.

**Koma xebatê ya Perwerdeyê:** Civaka Kurd a li Elmanyayê nexasim jî di mijara perwerdeyê de bi pirsgirêkên çareseriya wan giran re rûbirû ye, ji ber ku kêm pûte bi dîrok, çand û zimanê welatê wan tê dayîn û heta niha bi tenê tawîzên herî kêm ên sazûmanî hatine dayîn ji bo wan. Ji bo ku pirr kêm jî be ev şûna vê kêmasiyê bê dagirtin, me yekîneyên perwerdekirinê li ser mijarên siyaset, dîrok û tenduristiyê amade kirin.
**Koma xebatê ya Nûneriya Berjewendiyên Civakî-Siyas:** Ji bo piştgiriya beşdariya civakî-siyasî û nûneriya guncaw û maqûl a civaka Kurd hewl tê dayîn di nava struktur/avahiyên civakî-siyasî de cih bê girtin.


**Tekilî:**
**Netzwerk kurdischer AkademikerInnen e.V.**
Postfach 102801, 44028 Dortmund

Internet: www.kurd-akad.com
Email: info@kurd-akad.com


KURD-AKAD
NETZWERK KURDISCHER AKADEMIKERINNEN e.V.

Piştgirvan

Civaka Azad
Kurdisches Zentrum für Öffentlichkeitsarbeit e.V.

Konferans a Kurd-Akad

# Şerê li Rojhilata Navîn: modela alternatîfên paşarojê bi giredayîya perwerdê û guherendina civakê




Şemî
**13.04.2019**
**Saet: 13:00 – 18:00**
**Cih: Saalbau Bockenheim**
**Schwälmerstr. 28, 60486 Frankfurt a.M.**

**Amedêkar: KURD-AKAD**
**Tora Akademîsyenên Kurd**

Li Rojhilata Navîn hê jî şerên awahî cûr be cûr didomin. Kurd jî heremêde faktorek û rolekî navendîdene. Opsîyona çareserîyê ya Kurdan xweserîya demokratîke, e kû rengê xwe daye Federasyona Demokratîk Sûryiya-Bakûr/ Rojava. Bi wî girêdanî ye de Perwerdehî rolekî navendî dilêze taybetî guherendina civakê û demokratîbûnê de.

Bi wî Konferansê, ê kû dû beşen peyhev û niqaşa dawî bi hemû beştervanan pêk te, em dixwazin şeren Rojhilata Navîn binirxînin û modelên alternatîf ya paşerojê bidin naskirin.

Beşa yekemîn de em dixwazin şerê Rojhilata Navîn ji perspektîfa kurdan binirxînin. Pê ve giredan, taybetî biçavê destkeftên kurdan, em dixwazin bal bikşînin Tirkîye, le belê pewîste giranî bidin pergala perwerdeyê Tirkîye.

Beşa dûemîn de perspektîfa perwerdehîyê ji bo aşîtîya heremê, her wiha pêwîste balkeşî bikşînin alternatîfên heremî bi tekîldarîya perwerdehî û guherendina civakê.

Nîqaşa dawî de te ser çetineyên û perspektîfê ji bo demokratîkbûna heremê were sekinandin.

**Beşa I:**
**Rojhilata Navîn: Kurd navbera Asîmîlasyonê û Xweserîyê.**

Kurd li nav şerê Rojhilata Navîn:
ji faktora şerê rola listîkvanê demokrasîyê
> **PD Dr.Ahmet Yıldırım**
*( Parlamentarê berê ya HDPê)*

Sîyaseta perwerdehû ya AKPê:
Reform hember Endoktrasyon û Asîmîlasyon
> **Sakine Esen-Yılmaz**
*(Mamoste, sekretara giştî ya sendîka Egitim Sen ya berê, Köln)*

**Peşkeşvan: Nilgün Kaya**
*(Kurd Akad, Frankfurt a.M.)*

**Beşa II: Ji şer rizgarbûn û derbasbûna krîzê: Perspektîfên Perwerdehî û Fêrkirin (guherendina civakê)**

Perspektîfa Perwerdehî û – Zayend
> **Prof. Dr. Kariane Westrheim**
*(Perwerdenas, zanîngeha Bergen, Norveç)*

**Gotara kurtasî:** Rexneyê karê civakê – Nêrîna heremî ser krîzê û nû pozîsyonkirin
> **Cihan Ünlübayir** *(Xebatkarê civakê, Frankfurt a.M.)*

Dibistan nava şer de: Çima Perwerdehî nikare bisekine
> **Vezîrê Perwerdehî ya Kantona Cizîrê**, Rojava

**Peşkeşvan: Eda Tedik**
*(Perwerdena, Kurd Akad, Frankfurt a.M.)*

**Niqaşa Dawî:**

**Demokrasî li Rojhilata Navîn-Çetîneyan û Perspektîfan**

**Peşkeşvan: Ercan Ayboga**
*(Endezara hawîrdor, çalakvanê okolojîyê û hevniviskarê pirtûka „Revolution in Rojava-Frauenbewegung und Kommunalismus zwischen Krieg und Embargo“*

SAALBAU Wir machen Begegnungen möglich!
Ein Unternehmen der ABG FRANKFURT HOLDING

**SAALBAU Bockenheim**
Schwälmer Straße 28 I 60486 Frankfurt am Main

Fon (0 69) 77 75 46 I Fax (0 69) 7 07 50 48
Mail. sb-bockenheim@saalbau.abg-fh.de






Weitere Informationen zum SAALBAU Bockenheim und unserem Raumangebot finden Sie im Internet unter **www.saalbau.com**